Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Newroz

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Hejmar (98) sal 17 Hizêran 2011 z - 2623 k Buha (15)ps

Gelo Sûriya avis e ?

Eve bêtirî çar heyvane, ku hundirê Sûriyê dikele û her diçe germtir dibe , ne ji ber ku xwepêşandanên gelêrî û aştiyane li gelek bajar û herêman berdewam in û hew , lê belê ji ber ku bersivdana karbidestan ji van xwepêşandanan re, bersiveke nemirovane, sergermî û xwînî ye , bi girtinên ketûber , kuştin , û rûdawên leşkerî bi hemwelatiyên xwe re didin û distînin .

Ta niha , li gor jêderan , dora 1500 kuştî , bi hezaran birîndar , bêtirî 10000 girtî , û dora 15000 ên ku malên xwe li şûna xwe hêştine û berê xwe dane Turkiyê , Urdin û Libnanê , bûne koçber û penaber .

Bajarên Hema , Homis , Dêrazorê û ji berî wê bajar û derdora Derayê û derdora Şamê , ta tu bigihê herêmên parêzgeha Idlibê – sînorê Turkiyê(Hatayê – Iskenderon) – têra xwe xelk hatiye civilandin , mal wêran bûne , birînên kûr û xedar vebûn e , dijatî peyda bûye û her weha pirsa aştiya civakê kêm zêde têkçûye .

Bajarên dî yên mezin mîna Heleb , navenda Şam , Reqê , Hesekê û Siwêdayê digel Tertus û herêmên dî , ne di tevger û rewşeke germ û balkêş mîna herêmên dî de ne. Lê , li dawiya dawî rewşa civaka Sûriyê serûber rewşeke zor taybet û awarte ye , û ku weha bidome baş ne xuya ye D.R (11)

Pîreka jîr û zana — **4**
Nûşîn Bêcirmanî

Namak ji Newrozê re — **6**
Riza Çolpanê Dêrsimî

Ezmunek dîrokî li pêş me ye — **8**
Birasozê Sirûc

Jinik û Şêr — **9**
Ahîn Zozanî

Email : Newroz 95 @ hotmail . com